

Pirs û bersivên derbarê „Qaydeyên Parastina ji Vîrûsa Koronayê“ – ji 22ê sibata 2021ê bi şûn de derbasdar e

Sînordarkirina kîjan têkiliyan hîn jî berdewam e?

Heta 7ê adarê ev sînordarkirinên têkiliyan yên li jêrê derbasdar in:

Hevdîtînen li derveyî malê tenê di navbera kesên ji malekê û kesekî ne ji malê serbest in. Eger ligel wî kesî zarokên ji malê yên pêwîstî bi çavdêriyê hebin, ev yek jî serbest e; Di çarçoveya hevdîtina dêbavên hevdu berdayî jî, dîsa serbest e ku zarokên pêwîstî bi çavdêriyê hebin, di hevdîtîne de hebin. Istisnayên derbarê mesafeya di navbera kesan de, yên ku heta niha derbasdar bûn, ji niha bi şûn de jî bi pirranî derbasdar dimînin û di maddeya 2 bend 2 ya Qaydeya Parastina ji Vîrûsa Koronayê de hatine diyarkirin. Istisna ji vê qaydeyê, zarokên ku li qadên leyîstinê dilîzin e, bikaranîna trê û otobûsan e (di trê û otobûsa de divê maskeyên tibî bîn bikaranîn), anjî çavdêrî û pêreçûna zarokên temenbiçûk û kesên pêwîstî bi alîkariyê heyî ye.

Herwiha bikaranîna mecalên hatûçûnê (otobûs, minîbûs) yên xêrxwazî, anjî yên şaredariyê yên ku bo mînak li ser rêya navendeke derzîkirinê bin, li gor Qaydeya Parastina ji Vîrûsa Koronayê istisnayeke û serbest e.

Derbarê ferzkirina bikaranîna maskeyan de çi şert hene?

Ji niha û bi şûn de jî li hinek cih û qadên taybet divê maskeyekî tibî bê bikaranîn. Maskeyên tibî li gor Qaydeya Parastina ji Vîrûsa Koronayê ew maskeyên emeliyatê yên li gor qaydeya EN 14683 (divê li ser kartona maskeyê nivîsandî be), anjî maskeyên li gor standarta KN95/N95, anjî FFP2 û maskeyên qalîteya bilindtir in – lê hemû jî bêtî moxila bêhdanê. Ferza ku divê maskeyekî tibî bê bikaranîn li van cihên jêrê diyarkirî heye, herwiha divê mesafeya di navbera şexsan de jî bê parastin û maske divê jî bê bikaranîn:

- li dikanên pêwîstiyên rojane, dermanxane, benzînxane, banke û hwd. Herwiha li daîreyên bijîşkan û dezgehên tibî yên mîna wan.
- di trê û otobûsan de – herwiha li trênxane û rawestgehan jî
- di dema bikaranîna mecalên hatûçûnê (otobûs, minîbûs) yên xêrxwazî, anjî yên şaredariyê yên ku bo mînak li ser rêya navendeke derzîkirinê bin
- di dema dersên perwerdeyê yên serbest û ezmûnên li gor maddeyên 6 û 7 yên li gor Qaydeya Parastina ji Vîrûsa Koronayê
- di dema îbadeta olî de û rengên din yên civînên ji bo pêkanîna wacibên olî – herwiha li ser kursiyên li cihê îbadetê jî.

Ferza bikaranîna maskeyekî tibî herwiha li berberxaneyan jî heye ku îhtimal e di 1ê adara 2021ê de vekin. Li gor qanûna dewleta federal (Qaydeya Parastinê ya Kar SARS-CoV-2 ya Wezaretê Federal ji bo Kar û Civakî ya 21ê çileyê 2021ê) divê li kargehan jî li wan cihan maske bîn bikaranîn, ku mecala parastina mesafeya 1,5 metre tine. Di rewşeke wiha de xwedanê kargehê divê maskeyên tibî ji bo karmendên xwe peyda bike.

Ferza bikaranîna maskeyan (ji kêmasî maskeyên normal) di van rewşên li jêrê diyarkirî hîn jî berdewam e, tevî ku bikaranîna maskeyên normal têr dike:

- di cihên giştî yên sergirtî yên bêtî pencere de, eger ew ji bo mişteriyên anjî mêvanan (bi kontrol anjî bêtî kontrol) vekirî bin,

- li bazar û cihên din yê kirrîn-firotinê yê servekirî,
- li tevaya hewş û parkên dikanên pêwîstiyên rojane, herwiha li ser 10 metreyên dawî yê rêyên ku diçin deriyên dikanan.

Derbarê ferz kirina bikaranîna maskeyan ji aliyê zarokan ve çi şert hene?

Ji niha bi şûn de jî, zarokên biçûk yê ku dest bi dibistanê nekirine, ne mecbûr in ku maskeyan bikarbînin. Zarokên di jêr 14 salan de, eger maskeyên tibî dev û bêvila wan baş neparêzin, dikarin maskeyekî normal bikarbînin, herwiha li wan cihan jî ku normalî ferza bikaranîna maskeyên tibî heye.

Derbarê ferz kirina bikaranîna maskeyan li baxçeyên zarokan û dibistanan de çi şert hene?

- Li dibistanan ferz e ku şagirt maskeyên tibî bikarbînin, lê şagirtên heta polê (sinifê) 8an dikarin maskeyên normal jî bikarbînin, eger maskeyên tibî (hêj) baş dev û bêvila wan neparêze.
- Li baxçeyên zarokan tenê ji bo kesên temenmezin ferz e ku maskeyan (divê yê tibî bin) bikarbînin, ew jî tenê di wan rewşan de eger ku nikaribin mesafeya pêwîst (1,5 metre) dûrî hev bimînin. Ev yek jî bo dêbavên zarokan jî derbasdar e, bi taybetî di dema anîn û wergirtina zarokan de.

Kengî berber û xizmetên ne tibî yê ciwankariya piyan dikarin dîsa dikanên xwe vekin? Ji bo dikanên din çi şert hene?

Ji 1ê adarê ve berberxane û dikanên ciwankariya piyan dikarin dîsa deriyên xwe vekin û mişterî dikarin ji xizmetên wan sûd wergirin. Bi liberçavgirtina giringiya pakiya laşî, bi taybetî kesên temenmezin pêwîstiya wan bi van xizmetan heye, ku ev demeke dirêj ev xizmet hatibûn rawestandî. Dikanên din yê xizmetên ku ji aliyê tibî ve ne pêwîst in, bo mînak weke dikanên ciwankariyê, yê ciwankariya neynûkan û deqkirinê (tattoo) heta 7ê adarê girtî dimînin, ji ber ku ji bo van xizmetan sedemên istisna tine.

Rewşa qanûnî di qadên xwaringeh û otêlan de çi ye?

Restorant û xwaringeh ji niha bi şûn de jî girtî dimînin, ev yek bi gelemperî ji bo kantîn û xwaringehên dezgehên jî derbasdar e, ango ew jî girtî dimînin. Tenê daxwazkirin û anîna malê, anjî wergirtina xwarinê li xwaringehan serbest e. Kantîn û xwaringehên şîrket û dezgehên perwerdeyê dikarin istisna ji bo karmend û şagirtên dezgehên perwerdeyê bînin vekirin, eger wekî din ne gengaz be ku kar an perwerdeyek bi rêk û pêk bê kirin.

Razan/mayîna li otêlan bi mebesta bêhnvedanê û şexsî ji niha bi şûn de jî qedexe ye. Razan/mayîna li otêlan ya ji ber kar an jî erkekî, weke karekî şexsî nayê hesabkirin û serbest e.

Dikan girtî ne?

Belê. Dikan heta 7ê adarê girtî dimînin. Lê ev şeweyên dikanan yên rêzkirî vekirî ne: Dikanên xwarinê, dikanên ku eşyayan tînin malê, anjî ku mişterî dikare eşyayan ji ba wan wergirê, dikanên vexwarinan, bazarên xwarinê yên li derve, dermanxane, dikanên eşyayên tibî, dikanên taybet yên eşyayên zarokên biçûk, benzînxane, banke, Sparkasse, poste, kiosk û rojnamefiroş, dikanên eşya û xwarinên heywanan, kombazar (ji bo mişteriyên kombazaran), cihên xwebexş yên alîkarî û parvekirina xwarinan (Tafel).

Dikanên eşyayên avadaniyê û baxçevaniyê dikarin vekin?

Dikanên eşyayên avadaniyê û baxçevaniyê tenê ji bo şîrketan û xwediyên kargehan vekirî ne. Istisna ji vê qaydeyê, gulên birrî, şitlên keskayiyên di kûpikan de, ku zû hişk dibin, herwiha şitlên sewze û tov in (zad, pîvaz, petatê çandiniyê û hwd.): Dikanên eşyayên avadaniyê û baxçevaniyê dikarin van eşyayan û eşyayên têkildarî wan bifiroşin kesên prîvat jî. Lê dikanên eşyayên avadaniyê û baxçevaniyê dikarin tenê van eşyayan rêzkirî bifiroşin kesên prîvat û nabe eşyayên din bifiroşin wan.

Rewşa qanûnî di qadên gulfiroşiyê, firotina şitlên sewze/şênkatî û tov de çi ye?

Dikanên ku gulên birrî û yên di kûpikan de, ku zû hişk dibin, herwiha eşyayên têkildarî wan (kûpik û hwd.) difiroşin, jixwe heta niha jî destûr ji bo wan hebû ku vekirî bin. Ji 22ê sibatê bi şûn de ev dikan êdî dikarin şitlên sewze û tov jî bifiroşin.

Kirrîn-firotina bi rêya postayê û wergirtina eşyayan ji aliyê mişterî ve serbest e?

Belê. Kirrîn-firotina bi rêya postayê, herwiha şandina eşyayên daxwazkirî ji niha bi şûn de jî serbest e. Lê wergirtina eşyayên daxwazkirî ji aliyê mişteriyên ve tenê bi wî şertî serbest e, eger di çarçoveyekê de pêk werê ku tedbîrên parastina ji vîrûsan hatibin girtin û radestkirina eşyayan bêyî têkiliya rasterast pêk werê.

Bi kîjan şertan perwerdeya muzîkê serbest e?

Ji 22ê sibatê bi şûn de ev biryar derbasdar e: Dersên muzîkê yên rûbirû yên bi yek şagirtî re ji zarokên biçûk yên temenê heta dibistan seretayî re êdî dîsa serbest in.

Dersa muzîkê ya rûbirû jî êdî dîsa serbest e, bi şertê ku di çarçoveya çavdêriya baxçeyên zarokan, anjî dersên dibistanên seretayî de be, anjî bi hevkarîya ligel wan bi komên diyarkirî yên şagirtên dibistanekê, anjî komên diyarkirî yên zarokên baxçeyên zarokan pêk werê.

Di van dersan de divê li gor mecalan odayên mezin bên bikaranîn, herwiha li gor rewş û mecalan jî ku şagirt bên parvekirin û hinek rûbirû bên perwerdekirin û hinek jî bi rêya înternetê, da ku hemû şagirt komî ser hevdu nebin.

Rewşa qanûnî ya perwerdeya mezinan çawa ye?

Bi gelemperî hemû ders û perwerdeya ji bo mezinan qedexe ne, herwiha ders û perwerdeyên bingehîn yên yedeg jî, herwiha çalakiyên ji bo întegrasyonê, herwiha ezmûnên sazî û dezgehên mîna Dibistanên Perwerdeya Gel (VHS) û saziyên perwerdeya mezinan, herwiha xizmetên saziya alîkariyê „Selbsthilfe“.

Li derveyî van qedexeyan, ev rewşên li jêrê istisna û serbest in:

- Dersên bi yek kesî re, herwiha rengên din yên perwerdeya yek kesî ya li derve û ne di odeyên girtî de,
- Dersên rûbirû yên polên dawî yên dewrên xwendinê yên bi armanca sertîfîkayên fermî qebûlkirî yên bi rêya xwendina duyemîn,
- Dersên rûbirû yên polên dawî yên bi armanca bidawîkirina pîşeyekî
- Ezmûnên rûbirû yên têkildarî bidawîkirina pîşe û dibistanan û ezmûnên ku dikevin xizmeta întegrasyonê, herwiha dersên rûbirû yên amadekar ji bo van ezmûnan, eger ew ji ber sedemên yasayî anjî sedemên pratîkî nikaribin werin paşxistin, anjî eger paşxistina ezmûnan zirareke ne maqûl bigihîne şagirtan.
- Xizmetên perwerdeyê yên li derveyî dersan yên bi piştgiriya dewletê ji bo şagirtên dibistanan, li gor maddeya 1 ya Qaydeyên Çavdêriyê yên Vîrûsa Koronayê, eger ew xizmet li ser bingeha „Rênişanên piştgiriya xizmetên perwerdeyê û çavdêriyê yên li derveyî dibistanan yên di dema Koronayê de“ ji bo kêmkirina paşguhixistinên têkildarî nexweşiya koronayê pêk werin.

Ji bo van istisnayan şert e ku tedbirên mesafe û parastinê bi dijwarî li ber çav bên girtin. Ji bilî wê yekê jî, divê li gor rewş û mecalan beşdar bên parvekirin û hinek rûbirû bên perwerdekirin û hinek jî bi rêya înternetê, da ku hemû beşdar komî ser hevdu nebin.

Zanîngeh û perwerdeya li derveyî dibistanan vekirî dimînin?

Perwerde û lidarxistina ezmûnan li zanîngeh û li dibistanên beşa tendirustiyê bi şertê liberçavgirtin û pêkanîna Yasaya Parastina ji Vîrûsan serbest e.

Ders tenê bi wî şerî dikarin rûbirû bên dayîn, eger paşxistina wan anjî dayîna wan ya bi rêya înternetê zirareke mezin bide xwendekaran.

Ezmûnên rûbirû û dersên amadekariyê yên ji bo ezmûnan tenê bi wî şertî serbest in, eger ew ji ber sedemeke girîng nikaribin bên paşxistin, anjî eger paşxistina wan zirareke ne maqûl bigihîne şagirtan.

Ders û perwerdeya navxweyî ya rûbirû, herwiha ezmûnên têkildarî wan yên ji bo amadekirina fermanberan ji bo wezîfewergirtina di sazî û dezgehên fermî de, herwiha xwendina pîşeyî li zanîngeh, dibistan, sazî û dezgehên mîna wan yên bi perwerdeya wezîfedarên dewletê re mijûl, herwiha li dadgehan û daîreyên fermî qedexe ye. Li derveyî vê yekê, dersa rûbirû di polên dawî yên dibistanan de, herwiha di beşa dawî ya beriya ezmûnên dawî yên xwendinên pîşeyî yên ne gellek-salî de serbest in. Ji bo van dersan jî divê li gor mecalan odeyên herî mezin bên bikranîn.

Ferza karkirina li malê (Homeoffice) heye?

Wezareta Federal ya Kar qaydeyek derxistiye (Qaydeya Parastinê ya Kar SARS-CoV-2 ya Wezareta

Federal ji bo Kar û Civakî ya 21ê çileyê 2021ê), ku li gor wê divê karsaz ji bo karmendên xwe di hemû rewşên pêkan de mecala karê li malê peyda bikin. Armanca vê yekê ew e ku li cihê kar û li ser rêya kar têkiliyên di navbera karmendan de bîn kêmkirin. Ew qayde wê di demeke kurt de bikevê meriyetê, ango bibe qanûnî.

Rewşa qanûnî ya werziş û spora ne profesyonel çawa ye?

Werziş û spora ne profesyonel bi giştî di hundir û li ser hemû qadên fermî û şexsî (wek salonên fitnessê, avjengeh û cihên mîna wan) qedexeyê ne.

Lê ji 22ê sibata 2021ê bi şûn de êdî dîsa spora bi tenê, ya du şexsan, anjî ya şexsên endamên malekê li qadên sporê yê servekirî serbest e. Bi heman rengî perwerdeya sporê ya yek kesî jî serbest e. Ev yek bo mînak ji bo qadên sporê, qadên atlêtîkê, qadên tenîsê yê servekirî û qadên spora golfê derbasdar e. Di navbera kesên li ser qadê, herwiha di navbera komên kesan de, yê ku di heman demê de li ser qadên servekirî sporê dikin, divê hertim herî kêm 5 metre navber bê parastin. Bikaranîna odeyên komî, herwiha odeyên guhertina kincan û yê serşuştinê yê cihên sporê qedexeyê ne.

Bi liberçavgirtina qedexeya têkiliyê, ji niha bi şûn de jî bazdan, meşa bilez (speed walking) û rengên din yê spora li derveyê qadên sporê serbest e.

Çi bi sazî û dezgehên çandî tê?

Konsert û nîşandanên li şanoyan, opera û salonên konsertan, sînemeyan û saziyên din yê fermî an jî saziyên şexsî (yê çandî) heta 7ê adara 2021ê qedexeyê ne. Ev qedexeyê bi heman rengî ji bo muzexane, pêşangehên hunerî, galerî, qesr, keleh, şûnwarên bîranînê û cihên weke wan jî derbasdar e. Tenê sînemayên erebeyan (Autokino) ku di navbera erebeyan de 1,5 metre navber hebe, serbest in.

Rewşa qanûnî ji bo muzîkvanên profesyonel çawa ye?

Proveyên têkildarî kar ji niha bi şûn de jî serbest in. Herwiha ji muzîkvanên profesyonel re serbest e ku konsert û nîşandanên bêyî temaşevan, bi mebesta ku di ragihandin û înternetê de bîn belavkirin, tomar bikin.

Çi bi cihên bêhnvedanê û xweşî/kêfê tê?

Heta 7ê adara 2021ê vekirina van cihên li jêrê qedexeyê ye:

- Avjengeh û hewzên kêfê, studyoyên esmerkirina laş, hemam û avjengehên ava mîneralî û cihên mîna wan,
- Baxçeyên heywanan, parkên heywanan, parkên bêhnvedanê, qadên leyîstinê yê sergirtî û cihên mîna wan yê ji bo çalakîyên kêf û sporê (li derve û hundir),
- Salonên leyîstina qumarê, kazînoyên qumarê û cihên mîna wan,
- Klûb, diskotek û cihên mîna wan,
- Cihên laşfiroşiyê û cihên mîna wan,
- Geştên bi keştiyan, koçkeyên hespan, trênen kevna û cihên mîna wan.

Li cihên kîrrîna vîtikên ji bo lêyistina li ser pêşbirkan tenê wergirtina mexbûsa leyîstikê, pêşbirkê û her wekî din serbest e. Wekî din maneke dirêjtir (bo mînak da ku leyîstik/maç an jî çalakiya ku mirov li ser şert daniye bê şopandin) qedexe ye.

Hêj çalakî û kombûn serbest in?

Çalakî û kombûnên ku nekevin ber biryarên taybet yê Qaydeyên Parastina ji Vîrûsa Koronayê, heta 7ê adara 2021ê qedexe ne. Ev çalakiyên li jêrê rêzkirî – bi liberçavgirtina şertên têkildarî şeweyê çalakiyê yê taybet – serbest in:

- Kombûnên li gor Qanûna Kombûnê (bo mînak xwenîşandan)
- Çalakiyên ku dikevin xizmeta xwedîkirina bingeîn ya gel, parastina pergala ewlekariya giştî, anjî misogerkirina parastina niha û siberojê ya pergala civakî (bo mînak çalakiyên partiyên siyasî ji bo amadekariyên hîlbijartinan, anjî çalakiyên ji bo bexşandina xwînê)
- Rûniştinên (civîn) yasayî mecbûrî yê desteyên xwerêvebirina herêmî
- Rûniştinên yasayî mecbûrî yê desteyan, partiyan, civakan, komelehan, anjî kombûnên xwediyên malan, yê ku nikaribin bi rêya înternetê bîn lidarxistin
- Merasimên binaxkirina miriyan
- Merasimên fermî yê girêdana zewacê